

**EM** LI VIRIN  
JI VIRIN

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



**MECLISA JINAN A HDP'Ê  
BEYANNAMEYA HILBIJARTINA HERÊMÎ YA 2019'AN**

# JIN BI HEV RE BI RÊ VE DIBIN



Di dîrokê de şêwazên rêveberiyên li ser bingeha cudakariya zayendan hatiye saz kirin. Îro desthilatdar hebûna xwe dispêrin serdestiya navendparêz a zîlam û nasnameya jinê tune dihesibînin û bi vê riyê jinan dixine bin kontrola mêr û dewletê

Lê dîrok di heman demê de dîroka têkoşîna jinan a azadî û wekhevî û destkeftiyên wan e jî. Lewma me mîrateya têkoşîna vê dîroka ku jin di mijarên wekî civakî, siyasî, aboriya civakî de bûye xwedî gotin dewr girt. Rêveberiyên serdest hemû raye di destê xwe de kom kirine. Li dijî vê yekê me jî rêveberiyên xweser û herêmî yên pîrzimanî û pirçandî li nava malan, kolanan, gundan, taxan, bajar û bajarokan dest pê kir û em vê yekê didomînin.

Em di wê baweriyê de ne ku demokrasiya xwecihî dê riya civaka wekhev û hevpariya adil veke. Tevî ku polîtîkayên tecrîda girankiri û êrîşên dijwar neçariyê ferz dikin jî me tu caran dev ji civaka ku jin di nav de serwest in berneda û em bernadin!

Serdest li Rojhilata Navîn şerekî nû yê parvekirinê dimeşînin. Ev şer di heman demê de şerê li dijî têkoşîna demokratîk, ekolojîk, wekhevî, azadî û pêkvejiyanê ya hêzên gerdûnî û herêmî ye. Tifaqa faşîst a di vê deme de xwedî rol e, hewl dide ku desthilatdariya xwe belavî rêveberiyên herêmî jî bike. Lê li dijî van tifaqên faşîst û polîtîkayên şerxwaz bersiva me jinan neguherî. Feraseta me ya jiyana nû ku rêveberiya herêmî û li cihê wê rêvebirinê jî digire nava xwe, bi îdîaya hevjinê, bi hêza ku me ji azmûnên tevgerên azadî û demokrasiyê ya ji cîhanê girtî û bi hêza ku me ji şoreşa jinê ya ji Rojava bilind bûyî em ê sedsala 21'an bikin sedsala şaristaniya jinê û azadiya jinê!



**Em modela  
rêveberiyên  
herêmî ya  
demokratîk,  
ekolojîk û azadiya  
jinê xurt bikin û  
pêş ve bibin**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Desthilatdariya AKP'ê 17 salan bi polîtîkayên xwe serdestiya mêra-  
ne kûr kir. Bi vê riyê hewl da ku li hemû qadên jiyane azadî û mafên  
me yê ku me bi têkoşîneke dijwar bi dest xistine tengav bike.

Em hewl didin ku gotinên gelan derbasî nava siyaseta giştî û  
herêmî bikin. Lê ew hewl didin ku hemû kesî bêdeng bikin û hemû  
rayeyan di destekî de kom bikin. Niha jî dixwazin navendparêziya  
ku hemû raye di destê zilamekî de kom bûye bi rîya rêveberiyên  
herêmî temam bikin.

Qeyûmên ku ji hêla AKP'ê ve hatin wezîfedarkirin hemû destkef-  
tiyên me yê jinan ên di encama têkoşîneke mezin de hatibûn  
qezenckirin, xespkirin. Qeyûmên ku hatin ser kar pergala me ya  
hevserokatiyê hedef girtin. Di encama van êrîşan de hevserokên  
me girtin, navendên jinan, parastgehên jinan, qadên jiyane yê  
jinan, bazarên keda jinan desteser kirin û nivîsgehên polîtîkayên  
jinan û midûriyetên jinan girtin. Ev têrê nekir, jinên ku li van naven-  
dan dixetibûn jî ji kar avêtin, bi hinceta ku têkoşîna azadiya jinan  
dimeşînin yek bi yek girtin û doz li van xebatkaran vekirin.

Desthilatdariya hewl da ku jinê ji qadên jiyane dûr bixe, mekanîz-  
maya têkoşîna jinê ya xwecihî rasterast hedef girt. Qeyûmên ku bi  
fermana AKP'ê tevdişerîn, navendên têkoşîna dijî jinê yan girtin an  
jî navê van navendan wekî "navenda malbatan" guhert. Ev navend  
êdî ne wekî navendên çareseriya tundiyê û hevkeriya jinan, wekî  
parastina yekîtiya malbatê kar dikin. Ango veguherî sazîyên rewa-  
kirina tundiya li hemberî jinan

Ya ku destkeftiyên me jinan desteser dike, bi rîya KHK'yan jinan ji  
qadên ewle dûr dixê, çapemeniyê dixê bin bandora xwe, rêxistinên  
jinan û rêxistinên mafan digire û ya êrîşî akademî, zanist, pergala  
perwerdehiyê, mafê tendurustiyê, huner û nasnameya me ya za-

yendiyê bi kurtasî ya ku êrîşî şêwaza jiyana me dike jî dagirkerê qeyûm û polîtîkayên tecrîdê ye.

Vê desthilatdariyê rêveberên me rehîn girtin û mafê hîlbijartinê xesp kir. Bajar hilweşand û bi hezaran mirov koçber kirin. Bi zanebûn êrîşî çand û mejiyê civakê kir.

Tecrîda girankirî sûcê mirovahiyê ye. Lewma tecrîd di heman demê de mudaxaleya destkeftiyên jinan û pêşeroja jinan e. Li dijî tecrîda ku dixwaze jiyana me, pêşeroja me û têkoşîna me di şer û polîtîkayên neçariyê de bifetisîne, em ê têkoşîna xwe bilind bikin.

Tifaqa AKP/MHP'ê tevî ku li dijî tundiya li hemberî jinê şer nake jî mixabin peymanên wekî CEDAW û Stenbolê îmze kirine, jê direvin. Polîtîkayên ku dijminiya jinê dikin daraza zayendparêz a zilamtiyê bi biryarên wekî rewşa baş aşkera dike. Bi vê rejîma xwe ya cezayê jî newekhevî û cudakariyê pêş dixwe, tundiya zilam wek asayî nîşan dide.

Em ber bi hîlbijartinên herêmî ve diçin. Di vê hîlbijartinê de em ê dijminê jin û xwezayê paş ve bixin. Ew qadên ku bi riya xespê ji destê me hatine standin, em ê dîsa wan qadan bi dest bixin. Em ê tifaqa xwe ya demokratîk û hevkarîya xwe xurt bikin û xebatên hevpar bimeşînin. Em baş dizanin ku vê yekê jî em ê bi riya têkoşîneke bênavber û rêxistineke berfireh bi ser bixin.

Polîtîka û pêkanînên rêveberiyên herêmî rasterast tesîrê li jiyana me dike. Li malê, kolanê em feyde ji kîjan xizmetan digirin? Plan-saziya mekan heta şertên xwegihandinê, rewşa park, baxçeyan, ji ronahiya kolan heta qadên şînahiyê, ji xizmetên perwerdehiya zimanê dayikê heta bikaranîna çavkaniyan tevahî van polîtîkayan, teşe didin jiyana me.

Lewma riya teşeya jiyana me bi hev re pêkanîna polîtîkayên rê-

veberiyên herêmî û tevlîbûna pêvajoyên biryargirtinê ye. Ji bo em xwedî li jiyana xwe derkevin, rîya azadî û wekhevîyê, rêxistinkirina feraseta rêveberiya herêmî ya demokratîk û tevlîkar e.



**Em bi hev re  
bi ser ketin,  
em ê bi hev  
re bi ser  
bikevin**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**





Di her hilbijartinê de me hejmara şaredariyên xwe zêde kir. Di şaredariyên xwe de me nûneriya wekhev û pergala hevserokatiyê xist meriyetê. Bi van polîtîkayan me riya mafê axaftin û biryargirtina jinan jî vekir. Serokatiyên daîreya polîtîkayên jinan, têkoşîna li hemberî tundiya li ser jinê, parastgehên jinan, xetên alo şidetê, navendên îstîhdama jinan, kooperatîf, bazarên taxan, marketên mor, baxçeyên bajêr, wargehên xwendevanên keç û her weke din wekî mijarên sereke xistin rojeva siyasetê. Tevî hemû astengiyan jî me hemû xebatên xwe bi budceya wekheviya zayendî bi rê ve bir. Ne tenê ji bo Tirkiyeyê ji bo tevahiya cîhanê jî me îmze avêt bin pêkanînen mînak.

Di sala 1978'an de bi 3 jinên ku li Hêlwanê wekî endamên meclîsa şaredariyê hatin hilbijartin me dest bi azmûna xwe ya rêveberiyên herêmî kir. Me tu caran rêveberiyên herêmî tenê wekî şaredarî, meclîsa giştî ya bajêr û hilbijartina muxtariyê nedît. Destpêkê li herêmê me xwe bi awayekî resen wekî komele, yekîne, tevger, înisyatîf rêxistin kir. Di sala 1999'an de li Bazîd, Qoser, Dêrik û Giyadînê me 4 şaredariyên jin qezenc kir. Li wê dîrokê pergala desthilatdariya mêr dest danî ser şaredariya Giyadînê. 3 şaredariyên din me wekî qadên pîlot ên polîtîkayên têkoşîna dijî tundiya li ser jinê rêxistin kir. Di van şaredariyan de me bi destê jinê di însaya jiyana nû de israr kir.

Di hilbijartinên 2004'an de dewletê di polîtîkayên xwe yên destpêkê de têkoşîna azadiya jinê û piştî jî têkoşîna azadiya kurd ên tunekirinê kûrtir kir. Em jin hem li dijî êrîşên dewleta zilam û hem jî li dijî hişmendîya dij-demokratîk a civak û malbatê têkoşîyan û di van hilbijartinan de me 9 şaredariyên jinan bi dest xist, her wiha ji

sedî 300 me serkeftina xwe zêde kir.

Em hem bi azmûnên têkoşîna tevgerên jinên cîhanî û hem jî mîrateya tevgera azadiya jinên kurd em derketin rê û me peyman a civakî pêş xist. Me rêgeza beyana jinê esas e xist bername û rêzîk-nameyên rêxistin û partiyên siyasî yên tifaqa me dikin.

Di hilbijartina 2009'an de me kotaya jinê îlan kir û li gelek deveran me cihên serlêdana jinan vekirin. Êdî em ji dema ku bi jinê re nayê qezenckirin derbasî dema bi jinê re dê bê qezenckirin bûn. Her wiha li 15 cihan jin wekî şaredar hatin hilbijartin. Bi vî awayî gelek bajar û bajarok ji aliyê jinê ve hat rêvebirin.

Di hilbijartinên 2014'an de me modela rêveberiya herêmî ya xwese-riya demokratîk pêş xist û di şaredarî û meclîsa giştî ya bajarên de me pergala hevserokatîyê xist meriyetê. Lewma di 96 şaredariyan de jin wekî hevşaredar xebitîn û bûn kirdeyên polîtîkayên rêveberiyên herêmî. Lê rejîma AKP'ê di vê demê de polîtîkayên dij-demokratîk û zayendparêzî kûr kir û êrîşî destkeftiyên me yên demokratîk kir. Şaredariyên me yên ji aliyê gel ve hatibû hilbijartin, ji aliyê qeyûman ve hat desteserkirin û Tirkiye 90 sal paş ve xist.

Vîna jinê nayê xespirin, em ê xwedî li  
pergala xwe ya demokratik derkevin û  
jiyana nû saz bikin



**Em ê jiyana  
azadiya jinê li  
cihê wê ji nû ve  
ava bikin**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Di vê pêvajoya hilbijartinên 2019'an de tevî hemû polîtîkayên AKP'ê yên dij-demokratîk jî em bi şîara; 'em weed nakin bi hev re însa dikin' derketin rê. Em di polîtîkayên ku di encama bedelên giran de me bi dest xistine yên wekî hevserokatî, nûnertiya wekhev, pîrnameyî, pirçandî, civaka demokratîk, ekolojîk, wekheviya zayendî û di azadiya jinê de bi îsrar in. Bi hêz, biryar û baweriya birêxistinbûna jinê em ê bi hev re bixebitin, bi hev re însa bikin û destkeftiyên xwe bi hev re zêde bikin.

Em rêgeza bi rêveberiyên xwe re, pêşxistina civaka azad û kesa-yeta azad, komîna civaka demokratîk, hevgirtin, û di nav aştiyê de jiyana wekhev diparêzin.

Ji nû ve hûnandina nîrxên jiyana azad û wekhev, parastin û mayîndekirina vê yekê em bi polîtîkayên alîgirên jinê û li cihê wê birêvebirinê pêk tînin.

Ji nû ve hûnandina jiyana azad û wekhev, parastina wê, perwerdehiya zimanê dayikê, plansaziya bajarvanî, bi awayekî wekhev ji xizmetan sûd wergirtin, çapemenî û weşan, çand û huner, tendurustî, aborî, ekolojî, polîtîkayên estetîk û civakî em ê bi feraseta xwe ya rêxistina resen û xweser, bi jiyana azad, bi pergala hevserokatî û nûneriya wekhev bi ser bixin.

Di feraseta me ya ku xwe dispêre pirçandiyê de Kurd, Suryanî, Asûrî, Keldanî, Ereb, Tirk-Tirkmen, Laz, Çerkez, Roman, Ermenî, Elewî, Sunnî, Mislîman, Xirîstîyan, Êzidî û hemû komên din ên baweriyê wekhev in.

Pergala hevserokatîyê û nûneriya wekhev em wekî rêgezekê qebûl dikin. Em di wê baweriyê de ne ku divê jin li her qadeke resen û xweser xwe birêxistin bikin. Em wekheviya nasnameyên zayend û wekheviya hemû cudahiyên xwezayê esas digirin.



**Dijî rejima  
yekzîlamî em  
di hevserokatî  
û nûnertiya  
wekhev de bi  
israr in**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Ji bo ku siyaseta desthilatdariyê ya xespê û hişmendiya yekzilamî ya li ser rêveberiyên herêmî derbas bikin, ji bo ku em siyaseta heyî veguherînin siyaseta demokratîk em ê di rêveberiyên herêmî de pergala xwe ya hevserokatiyê û nûneriya wekhev bidomînin. Pergala hevserokatiyê di cîhanê de mînaka yekemîn e. Ev pergal mînaka têkoşîna azadiya jinê ya herî berbiçav e û serkeftineke gelekî girîng e.

Pergala hevserokatiyê; li hemû qadên jiyana vîna jinê xurt dike, jin bi vê pergalê dikare tevî hemû pêvajoyên rêveberiya bajaran bibe, bi vê pergalê di rêveberiyên herêmî de feraseta rêveberiya demokratîk derdikeve holê.

Salên demdirêj in şaredariyên jinê û rêveberiya demokratîk a Tevgera Azadiya Jinê heye. Ev yek ji bo me azmûneke mezin e. Bi vê hêza ku me ji mîrateya têkoşîna jinê girtiye em ê destkeftiyên xwe zêde bikin.

**Bi nûneriya wekhev** re em avasaziyeke tevîkar û sîwana civaka demokratîk înce bikin.

**Bi pergala hevserokatiyê** re emê hêza veguhertina polîtîk û nûneriya wekhev a siyaseta bidest bixin.

Bi rêgeza xwe ya **pergala zincîrê (fermuar)** em lîsteyên şaredarî û lîsteyên meclîsên giştî yên bajaran wekî jinek û zilamek amade bikin.



## Bi hev re ji demokrasiya xwecihî ber bi civaka demokratîk ve

- Li şaredariyên bajarên mezin, me serokatiya daîreya polîtîkayên jinan, li şaredariyên bajar û navçeyên din jî me maseyên jinan, lijneyên jinan û midûriyetên politikaya jinan saz kirin. Di bin banê van midûriyetan de me yekîneyên aboriya jinê, têkoşîna li hemberî tundiya li ser jinê, yekîneyên perwerdehiya jinê, malen piştgiriya jinê, kooperatîfên jinê û navendê jinê ava kirin. Ji bo ku di dema nû de jî polîtîkayên jinê bîn pêşxistin ew saziyên ku ji aliye qeyûman ve hatine girtin, em ê yek bi yek wan vekin û hejmara van saziyên xwe zêde bikin
- Ji bo jin bikaribin tevî biryarên şaredariyan bibin, em ê di bin banê şaredariyan de meclîsên jinan ava bikin.
- Ji bo ku lînêrîna jinê di polîtîkayên herêmî de serwest bibin meclîsa ku me di nav meclîsê de saz kiriye dê lijneya jinê û koordînasyona jinê ava bike û komîsyona ku hilbijêrên jin û zilam jî di nav de cihê xwe digirin, bi navê komîsyona wekhevîyê dê saz bike.
- Lijneya jinê bi tevlibûna rêxistinên jinan, însiyatîfa sîvîl, meclîsên taxan û meclîsa jinên şaredariyê em ê pêk bînin. Bi riya van lijneyan em ê pirsgirêkên xwe bi riya rêxistin û hevkarîyê çareser bikin.
- Di tevahiya yekîneyên ku polîtîkayên jinan tînin pêşxistin de em ê rêxistina resen a jinên ciwan pêş bixin û ji bo ew tevî hemû mekanîzmayên biryaran bibin, em ê piştgirî bidin wan.
- Di rêveberiyên herêmî de em ê tifaqa jinan a herêmî, neteweyî û navneteweyî pêş ve bibin.



**Em li hemû qadên  
rêveberiyên  
herêmî budceya  
wekheviya  
zayendîya civakî  
esas digirin**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**





Heke di rêveberiya herêmî de nûnertiya jinan tunebe, heke jin di wê rêveberiyê de nikarin biryar bidin û daxwazên wan pêk neyên di wê rêveberiyê de feraseta yekzîlamî heye. Lewma bi rejîma qeyûman ev feraseta yekzîlamî hate ferzkirin. Li dijî vê yekê ne tenê bi armanca pêşxistina feraseta demokratîk, ekolojîk û azadî, di he-man demê de em ê vê newekheviyê jî ji holê rakin.

Em baş dizanin ku ev armancên me li şaredariyan encax bi plansaziyeke stratejîk, budceyeke rast û bi tevîbûna meclîs û rêxistinên jinan mumkin e. Lewma em ê di xizmetên xwecihî de budceya ku newekheviyê ji holê radike, bi pêş bixin.



## **Bi budceya ku pêdiviyên jinan ku nivê civakê ne pêk bînin, bi budceya ku hişyariya tevîkar û zayenda civakî pêş dixîne re;**

- Em ê xebata ‘Li Herêmê Profîla Jinê’ bixin meriyetê. Bi vê xebatê em ê hê baştir pêdiviyên tesbît bikin û mudaxaleyê li newekheviyê bikin.
- Ji bo ku em budceya planên wekheviya herêmî, planên stratejîk a zayenda civakî berdeham bikin bi agahiyên ku ji profîla jinên herêmî û rewşa taxan a aborî-civakî kom bikin, em ê agahiyên cudakariya zayendî berhev bikin.
- Plansaziya stratejîk, bernameya performansê, analîza xebatan û projeyan em ê di mijara perspektîfa zayenda civakî de binirxînin. Ji bo tesîra vê yekê lêkolîn bikin em ê xebata ‘Nirxandina Tesîra Zayenda Civakî’ (TCED) bimeşînin.

- Bi saya 'Nirxandina Tesîra Zayenda Civakî' tesîra xizmetên rêveberiyên herêmî çî qasî di warê wekheviya zayendî de pêş dikevin, em ê bikaribin lêkolîn bikin û bişopînin.
- Ji bo ku jin bikaribin tevî çareserîya pirsgirêkên taxan bibin em ê 'Plansaziya Çalakiyên Wekheviya Taxan' bixin meriyetê.
- Tevahî planên çalakiyên herêmî em ê bi jinan re pêk bînin. Em ê bibin şopdarên performans û pêkanînen vê planê.
- 'Stratejiya Tevlîkirina Zayenda Civakî' tenê newekheviya zayendî ji holê ranake, di heman demê de balê dikişîne ser demên newekheviyê diafirîne. Lewma ev stratejî di warê polîtîka, xizmet û çalakiyan de pirsgirêk û pêdiviyên wan jî tesbît dike û li gorî wê budceyê terxan dike. Em ê stratejiya 'Nirxandina Tesîra Zayenda li hemû rêveberiyên herêmî, yekîne û mekanîzmayên xwe bixin meriyetê.
- Hemû xebatkarên rêveberîya herêmî em ê wekî berpirsyarên pirsgirêk û çareserîya wan bibînin.



**Em ê xwe jî  
bajarê xwe jî  
xwe bi xwe bi  
rê ve bibin!**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Armanca me ya sereke ew e ku tax, gund, bajar û bajarokan ji feraseta newekhevi û zayendparêziyê rizgar bikin!

Jin nîvê civakê pêk tînin. Plansaziya xwecihên ku bi awayekî newekhev pêk hatiye, dibe sedem ku pirsgirêkên jinan ên wekî; aborî, tenduristî û ewlehiyê zêdetir mezin bibe. Ev newekheviya di kesayeta jinan de pêş dikeve her ku diçe belavî hemû jiyana bajêr dibe.

Di encama plansaziya rêveberiyên herêmî de cudakariyên çandî hatine kûrkirin. Bajar bi xetên stûr hatine parçekirin, warên jiyana komîn hatine tunekirin, rêveberiya bajêr bi awayekî navendî hatiye pêşxistin, modela yek rengî hatiye ferzkirin. Lewma em li dijî van planên bajarên serdestiya zilam derdikevin. Em planên bajarvaniya ekolojîk ên ku bi lînêrîna jinê pirrengiyê pêş dixîne, mafê jiyana jinê, mafê tendurustî, perwerdehî û xwespartinê, dîsa mafê ewlehiyê diparêze esas digirin. Ji avahiyên heta qadên şîn, ji parkan heta meydanan em ê li her heremekê bibin xwedî gotin û biryar.



## **Warên ku daxwazên jinan pêk werin, hişmendiya xwe kûr bikin, bîra civakî xurt bikin em ê bi hev re pêk bînin.**

- Li dijî projeya îmara ku desthilatdariya zilam pêş dixîne û jinê tune dihesibîne em ê qadên pirrengiya jinê derdixîne holê, ava bikin.
- Tesîsên çandê yên jinan, pirtûkxaneya berhemên jinan, pêşangeh, qadên sporê yên taxan, parkên jinan, qadên azadiyê yên jinan em ê saz bikin.
- Ji bo jin dema ku ji gundan ji bo pêdiviyên xwe yên wekî kurrîn-firrotinê pêk bînin, perwerdehî û tendurustiyê tînan bajêr pêdiviyên xwe pêk bînin em ê navendên jinan ava bikin.

- Projeya bikaranîna çavkaniyan wekî av û her weke din... Em ê pêş bixin û ji bo jin xwe bi hêsanî bigihîninê em ê derfetan biafirînin.
- Ji bo jin di her kêlîya rojê de bi awayekî aramî tevbigerin em ê kolan biewle bikin û bernameya çalakîyê ya wekheviya taxê bixin meriyetê.
- Li rawestgehên giştî ji bo ewlehiya jinan em ê bi amûrên ronî ava bikin. Dîsa em ê li rawestgehên giştî butonên lezgin bi cih bikin ango telefonan bi cih bikin.
- Li hemû kolanên ku tarî ne û jin xwe lê ewle hîs nakin, bi saziyên eleqeder re em ê ronahî bi cih bikin.
- Di dema ku peyarê tîn sazkin em ê hemû pêdivî û daxwazên astengdar, zarok, pîr û kalan bigirin ber çavan.
- Projeyên veguhertina bajarên a dij-civak, xweza û jinê em red dikin. Li şûna wê em li xweçihê veguhertina bi projeyên civakî hatiye destekkirin esas digirin.



## **Li dijî polîtîkayên şer ên rasterast dîrok, çand û xwezayê hedef digirin em ê bi hev re têkoşîna xwe bidomînin!**

- Qadên ku hatine rûxandin li ser bingeha daxwaza niştecihên herêmê em ê bi hev re ji nû ve înşa bikin.
- Li dijî polîtîkayên di encama şer û pevçûnan de penaber bûne û veguhertina demografiyayê em ê bi hev re têkoşîn bikin.



**Li dijîserdestiya  
li ser xweza û  
jinê, em têkoşîn  
didin û jiyaneke  
ekolojîk ji nû ve  
înşa dikin**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Polîtîkaya qirkirinê ya ku hişmendiya jinê dixê bin hikmê xwe, li hemberî xwezayê jî dimeşînin.

Bi perspektîfa ekolojî ya rêveberiyên herêmi em têkiliya demokratîk a di navbera mirov û xwezayê de esas digirin. Bi modela xwe ya azadiya jinê esas digire, em ahenga ekolojîk a tevahî zindiyan diparêzin.

Dijî pêkanînen kapîtalîzmê yê wekî xweza û çandê mîna amûrekê bi kar tîne em mafên xwezayê diparêzin û vê yekê wekî rêgezeke sereke dibînin.

Ne tenê li hemberî mirovan, di heman demê de li hemberî tevahî cureyên nebat û sewalan, li hemberî av, ax, hewa, heyînen dîrokî û mîrateya çandî jî em xwe berpirsyar dibînin.

## Em bi hev re weed dikin, bi hev re însa dikin!

- Xwezaya sînoren ekolojîk ên bajaran em ê bigirin ber çavan û di wê çarçoveyê de em ê plansaziyên bajaran bixin meriyetê.
- Em ê nehêlin avahî li qadên çandiniyê, li çêregeh, daristan, gol û çavkaniya avê bête çêkirin. Di rêzîknameyên xwe de jî em ê van xalan zelal binin ziman.
- Li bajaran bi perspektîfa jinan em ê qadên şîn zêdetir bikin, nava bajaran di çarçoveya aştîya xweza mirov, bejahî û bajaran de ji nû ve saz bikin.
- Di plansaziya xwe ya bajarên jinan û ekolojîk de em ê cobar û robarên qirêj ên tesîrê li tendurustîya mirovan dikin, veguherînin korîdorên ekolojîk.

- Ji bo ku zanebûna ekolojîk di nava civakê de pêş bikeve em ê perwerdehiyan pêk bînin.
- Îro qadên jiyane hatine tengkirin, mafê xwespartinê tê talankirin, gel bi zorê ji cih û warên xwe tên penaberkirin di bin navê veguhertina bajarvaniyê de civak ji bîra xwe tê dûrxistin. Li dijî van projeyan di xizmetên bajarvaniyê de em ê pêşengî bikin û têkoşinê bimeşînin.
- Li şûna planên xwe dispêrin otomobîlan, em riyên meşê, bisiklet û pergala birayê ku li van qadan civakîbûn zêdetir e û hê erzantir e diparêzin. Lewma em vê plansaziyê wekî rêgeza bajarên ekolojîk a jinê qebûl dikin.
- Her sal bi dirûşmeya 'Heke dareke te ya çandî nebe tu jî tune yî' li gorî werzan em ê kampanyaya çandina şitlan pêk bînin. Em jin wê bi hev re daristanên bajarên ava bikin.
- Em ê gundên ekolojîk ên xwe dispêrin çandiniyê saz bikin û piştgirî bidin avasaziya kooperatîfan.
- Ji bo berhemên ekolojîk bîr bikaranîn em ê bixebitin û xwarin-vexwarina xwezayî pêş ve bibin. Ji bo enerjîya ba û tavê bê bikaranînin em ê bixebitin.
- Li hemberî hemû aktivîteyên dorhêlê qirêj dike û tendurustiya mirovan xira dike em ê tedbîran pêş bixin.
- Ji bo paqîjîya dorhêl û zanebûna civaka ekolojîk pêş bikeve em ê li taxan perwerdehî bidin, xwepêşendanan li dar bixin û pêşengîya vê yekê bikin.
- Ji bo tovên herêmî bîr parastin li saziyên eleqeder em ê 'malên tovên herêmî' ava bikin. Emê kooperatîfên hilberîna tovên herêmî bi pêş bixin û tovên herêmî bêpere belav bikin. Di



vê mijarê de bi komên eleqeder û saziyên rêxistina sivîl re em ê xebatên zanekirinê bidomînin.

- Ji bo em bi dilekî rehet ava zembeleyan vexwin em ê xebatên binesaziyê pêş ve bibin.
- Ji bo sewalên li kolanan dijîn em ê parastgehan ava bikin û li wan xwedî derkevin.



# Yên aborî afirandine em jin in

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Bêdadiya ku xwe dispêre metîngerî û desthilatdariya ku li ser keda jinê dimeşe em ê bi dawî bikin! Ji bo ku çanda talan û dagirkeriyê ji holê rabe, keda jinê bê dîtin, ji bo jin bikaribin tevî pêvajoyên hilberînê bibin û aboriya xwe biafirînin, ji bo parvekirineke wekhev çêbibe em jin bi budceya xwe ya li rêveberiyên herêmê re;

- Ji bo şaredarî, meclîsa giştî ya bajar, rêxistinên saziyên sivil, ode, sendîka tevî budceyê bibin em ê xebatên xwe bidomînin.
- Ji bo jin tevî xebatên aboriyê bibin û hilberîna kolektîf derkeve holê, em ê kooperatîfên jinên azad ava bikin. Li ser vê bingehe destpêkê atolyeyên çandinî û sewalkarî û piştire jî atolyeyên enerjî, perwerdehî, bazirganî û hilberînê em ê saz bikin û piştgirî bidin xebatên avasaziya kooperatîfan. Van hemûyan em ê bi hev re pêş bixin.
- Ji bo zayendparêziya ku di navbera jin û zilaman de cudakariyê dike ji holê rabe em ê projeyan pêş bixînin, kursên pîşeyî bidin û jinan tevî xebatên cuda bikin.
- Ji bo jinên ku perwerdehiya wan nivî de maye, perwerdehiya xwe temam bikin em ê piştgirî bidin. Di hilgirtina kar de em ê ji bo jinan nêzîkbûneke pozîtîf nîşan bidin.
- Ji bo îstihdama jinan zêde bibe em ê xebatên xwe berfireh bikin û navendên pêşxistina îstihdama jinê (KÎGEM)'ê belavî hemû şaredariyên xwe bikin.
- Zayenda penaberîya werzê mixabin jin in. Em ê projeya xwe ya bi navê "Ez dixwazim li cihê ku jê dayîk bûme têr bibim" pêş bixînin û ji bo pêşî li koçberîya werzê bigirin em ê xebatên xwe zêde bikin.

- Ji bo li bazarên taxan ji jinên ku berhemên xwe yê gundan bînin û lê bifiroşin cih bê veqetandin em ê xebatan bimeşînin û marketên mor vekin.
- Ji bo jin kargehan vekin em ê bernameyên piştgiriyê amade bikin.



## **Li hemberî feraseta kapîtalîzmê, armanca me ew e ku em di rêveberiyên herêmî de aboriya komîn bi pêş bixînin**

- Ji bo jin kooperatîf û komînen tax û kolanan saz bikin em ê piştgirî bidin jinan.
- Em ê malen tenûrê berfireh bikin. Ji bo aboriya jinan pêş bikeve em ê bûfeyên mor bixin meriyetê
- Ji bo jin di rêwîtiya nava bajarên de bi awayekî aram tevbigerin em ê kartên 'Jinkart' derxînin. Jin dê bikaribin van kartan di xwepêşendanên çand û huner, şano û sînemayan de jî bi kar bînin.
- Ji bo jin bikaribin bi awayekî azad tevî jiyane bibin li her taxê em ê perwerdehiya zimanê dayikê ya bêpere û krêşên 24 saetan dê xizmet bidin em ê vekin.



**Perwerdehiya bi  
zimanê dayikê ya  
bêpere wekheviya  
zayendî û  
demokratîk  
mafek e**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Desthilatdariya AKP'ê zayendparêziya newekhev ya di pergala perwerdehiyê de bi gotinên wekî; 'xwezaya vî karî wisa ye' kûr dike. Ev pergala perwerdehiyê mirov ji civakê qut dike û di navbera mirovan de pevçûnan pêş dixê. Her wiha rola zayenda civakî diyarde dike û tundiya li ser jinê rewa nîşan dide. Çand û zimanên cuda tune dihesibîne, bi vê riyê nifrîn û tirsê diafirîne.

Armanca me jî ew e ku bi ziman, çand, nasname û baweriyên cuda em bi hev re bijîn. Dîsa em ê wekheviya zayenda civakê û perwerdehiya bi zimanê dayikê ya bêpere biparêzin, pêş bixînin!



## **Ji bo perwerdehiyê dewrî rêveberiyên herêmi bikin em ê têkoşîn bikin!**

- Dersa wekheviya zayenda civakî di hemû mekanîzmayên perwerdehiyê de wekî derseke bingehîn em ê tevli hemû mufredata xwe bikin.
- Hemû mufredatên perwerdehiyê û pirtûkên dersan em ê ji zimanê zayendparêzî, navendparêzî, mîlîtarîst, şoven û nijadperestiyê rizgar bikin.
- Li hemberî karparvekirina zayendparêzî ya di pergala perwerdehiya heyî de em ê pirtûkên ku wekheviya zayendî esas digire amade bikin.
- Ji bo zarokên keç li dibistanan ji mafê perwerdehiyê hê baştir feyde wergirin em ê polîtîkayan pêş bixînin.
- Pirtûkên çîrokên ên ji bo wekheviya zayendî pêş bikeve dê bî amadekirin û em ê wan li taxan bêpere belav bikin.

- Ji bo zarokan em ê kreşên bi zimanê dayikê vekin. Ji bo ev kreş 24 saetan û bêpere xizmetê bidin em ê bixebitin û kreşên taxan vekin.
- Ji bo xwendevanên ciwan ên li zanîngehan dixwînin em ê wargehnan vekin.
- Hemû zimanên dîrokî yê bajarên ku em lê dijîn, zimanê me yê dayikê ne. Lewma rêveberiyên herêmi ew ê ji bo jinan kursên xwendin û nivîsandinê dest pê bike û ji bo jinan bernameyên perwerdehiyê saz bike.
- Polîtîkaya perwerdehiyê wekhevîya zayenda civakî ya ku ji bo xebatkarên şaredariyê jî dê tevli bibin ew ê bî destpêkirin.
- Midûriyeta pêşxistina perwerdehiya jinê û yekîneyên wê li şaredariyan dê bî vekirin.
- Li gorî vê yekê em ê bernameya perwerdehiyê bi hev re saz bikin.
- Li taxan ji bo pîşe pêş bikeve, jin bibin xwedî kar û kooperatîf bî avakirin em ê dest bi bernameya perwerdehiyan bikin.
- Malên jinên zane yê ku jin, zarok, ciwan, pîr û kal jî dê bikaribin agahî û azmûnên xwe lê parve bikin em ê ava bikin.
- Ji bo bernameya perwerdehiya akademîk, çandî, civakî, aborî û tendurustiyê ya ji bo jin û civakê em ê ekîbên perwerdehiyê birêxistin bikin.



**Xwegihandina  
xizmetên  
tendurustiyê  
ya wekheviya  
zayendî mafê  
sereke ye**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**





Em baş dizanin ku hikûmet polîtîkayên tendurustiyê bi feraseteke rantxwar pêş dixîne û her mirovekî/ê wekî mişterî dibine. Lewma em di wê baweriyê de ne ku divê xebatên tendurustiyê xebata herî sereke ya rêveberiyên herêmî be.

Ji bo jiyaneke tendurist, afirandina şert û qadên tendurustiya jêneveger e. Em ê li dijî her awayê hilberîn û xizmeta ku ji bo berjewendiyên pêş dikeve rawestin. Nêzikatiya me ya ji bo tendurustiya jinê, afirandina qadên jiyane ye. Lewma di vê mijarê de sekna me berfireh û cihê têkoşînê ye.

Feraseta serdest a zilam ku di mijarên wekî çandinî, av, xwarin, avahî, enerjî, maden, bajar, teknoloji, turizm, ragihandin, perwerdehî, ewlehî û her weke din xetereyên mezin diafirîne. Ev yek ji bo tendurustiya mirov-civak û xwezayê rewşeke giran pêş dixîne. Lewma li dijî vê yekê em ê bi hev re têkoşîna xwe bimeşînin.



## Em jinên ku jiyana û jiyandina esas digirin;

- Em ê xizmeta tendurustiyê ku mafêke civakî ye, bi zimanê dayikê pêk bînin.
- Li şûna ku zayenda jinê di çarçoveya zayendparêziyê de tenê wekî hilberîna zarokan tê dîtin em feraseta tevahî ya wekheviya zayenda civakî dibîne diparêzin. Ji bo navendên tendurustiya jinan bi zimanê dayikê û bêpere xizmetê bidin em ê li her qadan navendên tendurustiyê ava bikin.

- Polîtîkayên tenduristiyê em ê bi jin û rêxistinên jinan re amade bikin. Navenda tenduristiyê dê ji hêla rêxistinên jinan bên venêrîn.
- Perwerdehiyên li ser beden û tenduristiya jinan em ê pêş bixin.
- Ekîbên me yên gerok ji bo zanebûna jinan a di warê welidandinê de li gundan dê bigerin û perwerdehi bidin dayikan. Lewma xebat û xizmetên me yên navendên tendurustiyê dê berfirê bên meşandin.
- Li dijî tiryakê ya li ser zarok û keçên ciwan tê pêşxistin em ê têkoşîneke xurt bimeşînin.
- Li şaredariyan em ê yekîneyên têkoşîna li dijî tiryakê saz bikin. Ji bo em li taxan tevnên dildar en têkoşîna li dijî tiryakê ava bikin em ê kampanyayan bimeşînin.
- Di çarçoveya xizmeta tenduristiyê de ji bo navendên teşhîsa lezgîn zêde bibin em ê xebatan bimeşînin.
- Di xebatên tendurustiyê de em ê parastin û pêşvebirinê esas bigirin. Bi vê armancê bi riya yekîneyên ku em ê ava bikin re, em ê hewldana civakîbûna tendurustiyê pêk bînin.



**Ser rûyê  
erdê ne cihê  
dagirkerî, cihê  
xweparastina  
me hemûyan e**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Sermayeya ku bi piştgiriya desthildatdariyê bin-geha neolîberalîzmê diafirîne gund, bajar û bajarokan li gorî berjewendiyên serdestiya zilam û newekheviya civakî xwe ji nû ve saz dike. Li dijî vê yekê em dixwazin herkes ji mafê xweparastin û avahiyên feyde bigire.

Lewma em ê polîtîkayên avahî û xweparastina qadên wê yên şînahî, jiyana mirovan ewle dike, tendurustiya mirovan esas digire, her wiha têkiliyên cîrantiyê xurt dike pêş bixin.

- Di modela me ya rêveberiyên herêmî de em ê polîtîkayên xweparastinê yên ku cihê jin lê dijîn hişmendiya hemwelatiya wekhev xurt dike, wekî mijara sereke bibînin.
- Ji bo jinên bêmal, jinên mexdûrên tundiyê, jinên astengdar û jinên penaber xweparastinê ewle û tendurust em ê bi hev re însa bikin.



# Karesat û rewşa lezgîn ne çarenûs e

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Encamên karesatên xwezayî û yên bi destê mirovan tê pêşxistin ji ber rolên zayendî û civakî ji bo jinan xetereyên mezin diafirîne. Em baş dizanin ku heke rêveberiyên herêmî planên avahiyên bi awayekî rast bikin dê encamên van ziyanan jî gelekî kêmtir bin.

- Ji bo jin li hemberî karesat û ziyânên wan amadekar bin em ê jinan perwerde bikin.
- Ji bo jin tevî rêveberî û xebatên kêmkirina xetereyên karesatan bibin em ê xebatan bimeşînin.
- Li dijî neparastin û mudaxaleya karesatan em ê planên lezgîn pêş bixin.



# Hunera azadîxwaziya jinê mumkin e

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Li qada çand û hunerê ku serdestiya zilam teşe daye vê qadê, em jin yan wekî amûr hatin dîtin, yan jî ji ber em jin in berhemên me bînirx hatin dîtin. Lewma em jin herî kêr ji qadên hilberîna çandî û derfetên wê bêpar man. Di azmûna me ya rêveberiyên herêmî de em wekî jin bi têkoşîna xwe ya li her qadeke jiyanê me mudaxaleyî qadên çand û huner a serdest a zilam kir. Lewma me qadên xebatên çand û huner a ku jin bikaribin bi zimanê dayikê bêyî ku rastî pêkûtiyan bîn, me afirandin. Em ê afirandina van qadan bidomînin.

Ji bo ku em bi fikir û ramanên xwe, bi ziman û çanda xwe feraseta hunerê bi awayekî azad biafirînin û berfireh bikin li dijî hişmendiya desthilatdar em ê ji bo xebatên xwe yê hunera azadîxwaz û rexnewaz qadên nû vekin. Li dijî çand û hunera nijadperestî û zayendparêziyê em ê li her qadekê çand û hunera civakî û demokratîk pêş ve bibin û berfireh bikin.



## Ji bo em xebatên jinan ên çand û hunerê diyarde û berfireh Bikin

- Xizmetên çand û hunerê em ê bigihînin hemû kesî
- Ji bo ku jin di hunera nivîskî û devokî de zimanê dayikê bi kar bînin û pêş bixin em ê berpirsyariyê ragirin ser milê xwe û têkoşîna vê bi hev re bimeşînin.
- Rewşa jinan a civakî, nijadî, aborî û astengdariyê em ê li ber çavan bigirin û politikaya ku çand û huner a jinên ji her qadê digire nava xwe, biparêzin.
- Di bin banê şaredariyan de em ê akademiya çandê ya jinan ava bikin.



- Ji bo jinên ji çandên cuda hunera xwe bidomînin û diyarde bikin em ê xebatên fîzîbîlîteyê bimeşînin.
- Em ê xebatên dîroka devokî û etnografîyayê bimeşînin û xebatên tomarkirina çandên cuda jî dewam bikin.
- Ji bo şaxên çandan berfirehtir bikin, em ê mala dengbêjên jin ava bikin û atolyeyên xwe yê çandê zêdetir bikin.
- Ji bo jin hilberîna çandê hêsantir bikin, em ê atolyeyên bêpere, salonên xebatê û stûdyoyan vekin.
- Ji bo koro û orkestrayên jinan pêk werin, em ê danasîna keda jinan a di warê çand û hunerê de bikin.
- Ji bo jin hê zêdetir tevî biryar û xebatên hunerê bibin, em ê piştgirî bidin saziyên jinên ciwan.
- Em ê bi komên çand û hunerê yê gerok re hewl dibin ku li hemû kolan, tax û gundan xwepêşendanên şano, çand û hunerê li dar bixin û pêşengeha wêneyan vekin.
- Ji bo zarokên jinên tevî xwepêşendanên çand û hunerê dibin, em ê kreşên hunerê vekin.
- Xebatên pirtûkxaneya berhemên jinan û muzeya jinan bixin meriyetê.



**Çezenckirin  
ne tevlîbûn,  
pêşbirk ne  
pêşketina  
hevpar**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Spor mafê jinan e. Em jin sporê dê ji gotin û polîtîkayên zayend-parêz, nijandperest û şovenîzmê rizgar bikin. Li dijî teşeya serdestiya zilam, em ê polîtîkayan pêş bixin. Bi riya rêveberiyên herêmî, em ê xebatên sporê ya wekheviya civakê diparêze bimeşînin.

- Ji bo jin tevî xepêşendanên sporê bibin, em ê hejmara kompleksên sporê zêdetir bikin.
- Em ê xizmet û xebatên sporê bi zimanê dayikê bimeşînin.
- Ji bo piştgirî û hevkarîya jinan, em ê li taxan turnuvayên sporê li dar bixin.
- Em ê piştgirî bidin klûbên amator ên sporê yê hatine avakirin û dê bîn avakirin.
- Di park û projeyên parkên nû de, em ê amûrên sporê bi cih bikin û qadên sporê ava bikin.
- Li gelek taxan em ê kursên soberiyê vekin.



# Jin astengiyan nas nakin

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Jinên astengdar gelek caran ji mafên jiyane bêpar dimînin û rastî gelek astengiyên tî. Lewma ji ber hem jin in û hem jî astengdar in rastî cudakarî û tundiyê tî. Ajokarên otobûsên şaredariyê bi hinceta ku kursiyên biteker cih digirin nahilgirin otobûsê. Hema hema li hemû daîreyan xizmeta zimanê îşaretê nayê dayîn. Polîtîkayên bajar û civakî bi lînerîna wekî jinên astengdar mihtacî mal, malbat û alîkariyê ne, nêz dibin.



## **Dijî vê pergala cudakar ji bo jinên astengdar ji van maf û azadiyan bi awayekî wekhev fêde bigirin em ê polîtîkaya xwe bi pêş bixin.**

- Em ê di bin banê Nivîsgehên Jinê û Midûriyetên Jinê de, ji bo ku jinên astengdar beşdarî jiyana civakî bibin û di warê perwerde, tendurustî, spor, stargeh, veguhastin, kar û mafan de rastî astengiyên neyên, em ê Yekîneyên Wekhevîyê ava bikin.
- Bi riya van yekîneyan, em ê pîrsgirêkên jinên astengdar vekolin û derbarê wan de nexşeriya çareseriyê ava bikin.
- Em ê hemû polîtîka û xizmetên rêveberiyên herêmî, li gorî pêdiviyên jinên astengdar bi rêk û pêk bikin.



**Cudahiyên me  
dewlemendiya  
me ye, em ê li  
dijî cudakariyê  
têkoşîna xwe  
bikin yek**

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Encamên herî giran a polîtîkayên şer û pevçûnê, koçberî û penaberî ye. Em polîtîkaya ku xizanî, şidet, cudakarî û kedxwariyê li ser jinan ferz dike, qebûl nakin. Em nahêlin jin di karê dîplomasiyê de bibin mijara bazara mêran û bazirganiya mirovî. Em nahêlin ku ev polîtîka wek çarenûs, li ser jinan bê ferzkirin.

Di rêveberiyên me yê herêmî de, di xizmetên perwerde, tendurustî, stargeh û hemû xizmetkariyan de, jinên penaber wê wek hemû jinên herêmê, rastî tu astengiyan neyên. Hemû jin dê bi awayekî wekhev bi zimanên xwe yê dayikê, ji xizmetan sûd wergerin.



## **Ji bo ku jinên koçber û penaber, di nav jiyaneke birûmet û siberojeke ewle de bijîn;**

- Em ê li dijî şerê ku mirovahiyê dike penaber, bi hev re têbikoşin.
- Em ê bi jinên koçber û penaber ên ku ji ber şer û kedxwariyê welatê xwe terikandine, rêxistina xwe bi pêş bixin û li dijî kedxwariyê bi hev re têbikoşin.
- Em ê qadên îstihdamê ava bikin û hewl bidin ku jinên koçber û penaber di nav şertên misoger û ewle de bi awayekî azad bixebitin.
- Li dijî polîtîkayên zayendparêz, em ê li ser esasên wekheviya zayendî, di nav jinan de polîtîkayeke penaberiyê ya li gorî jiyana wekhev bi hev re ava bikin.
- Ji bo ku gelên herêmê di nav ahengekê de bijîn, ji bo aramî û ewlehiya jinên koçber û penaber, em ê bi saziyên civaka sîvil re tevbigerin.

- Em ê li dijî her cure şidet û êrîşên li ser jinên penaber, bi hev re têbikoşin.
- Em ê hewl bidin ku li dijî şideta mêran, jinên koçber û penaber, di hemû mekanîzmayên wek penageh, navendên jinan de, bi awayekî wekhev, sûd wergirin.
- Li dijî her cure şideta li ser jinên penaber û koçber ên wek şideta zayendî, zewicandina bi darê zorê, bazirganiya mirovî û fihûşa bi darê zorê, em jin, em ê plansaziyeke karîger bi hev re ava bikin.
- Ji bo ku mafên jinên di kampên penaberiye de dijîn neyên binpêkirin, em ê hewl bidin ku standarteke însanî bê avakirin û em ê bi awayekî nîzamî, bi saziyên civaka sivil û saziyên jinan re mekanîzmayeke kontrolê ava bikin.





# Tundiya li ser jinê, polîtîk e

**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**



Şideta zilaman a li dijî jinê û cudakarî, li kolanan, li malan û di zimanê siyasetmedaran de ye! AKP, şideta li ser jinê, ji bo kemilandina desthilatdariya xwe ya serdest, yekparêz û otorîter bi kar tîne û dixwaze bi vî awayî jinan têxe bin kontrola xwe. Li dijî desthilatdariya faşîst a şideta li ser jinê rewa dike, êrîşî zimanê me, bedena me, îradeya me, rêxistina me û destkeftiyên me dike, em jin, em ê hêz û cesaretê bidin hevdu û jiyaneke azad ava bikin.

Qeyûman hemû navendên jinan, penagehên jinan û hemû mekanîzmayên têkoşîna li dijî şidetê girtin û bêbandor kirin. Lê bila qeyûm baş bizanibin ku, em jin, em ê zêdetir destkeftiyên bi dest bixin û van qadan zêdetir belav bikin. Ji bo têkbirina şideta mêrane, ji bo bidestxistina mafê me û jiyana me, em ê di rêveberiyên herêmî de, avakirina mekanîzmayên li dijî şidetê berdewam bikin.



## **Di rêveberiyên me yên herêmî de, ji bo têkoşîneke karîger li dijî şideta zilam;**

- Em ê ji bo tesbîtîkirina berbelaviya şidetê, yekîneyên lêkolîna şideta li dijî jinê ava bikin û raportên fîzîbîlîteyê amade bikin.
- Em ê polîtîkayên xwe yên li ser jinan, bi serpereştiya jinan û tecrûbeyên jinan ava bikin.
- Di rêveberiyên me yên herêmî de, ji bo têkoşîna li dijî şideta li ser jinê, em ê her sal nexşerê û plansaziyan birêkûpêk bikin.
- Her jin û zaroka/ê ku piştgiriyê ji navenên xizmete yên rêveberiya herêmî werdigire, em ê ji li gorî pêdiviya wan piştgiriya wan bikin.

- Em ê hejmarên navendên jinan, penagehên jinan û navendên piştevaniyê yê jinan zêdetir bikin, da ku jinên ku rastî êrîşan tèn û ji piştgiriya civakî, psîkolojîk, aborî û hiqûqî mehrûm in, jê sûd wergirin.
- Em ê li her derê ku nifûsa wê ji 50 hezaran zêdetir e, li beramberî nifûsa 10 hezar herî kêr, nivînek di tê de, di bin banê rêveberiyên herêmî de, hejmara penagehan zêde bikin.
- Ji bo pêdiviyên jinên ku di bin xetereya tundiyê de ne, em ê ji bo nirxandina rewşa wan, hejmara “îstasyonên destpêkê” zêdetir bikin.
- Di navendên jinan û penagehan de, li dijî her cure cudakariyê, em ê jîngehên azad ji bo jinan ava bikin.
- Di hemû yekîneyên me yê piştevaniyê de, zarok dê wek kesayetan ji hemû piştgiriyan sûd wergirin.
- Di şaredariyan de, li dijî tundiyê, em ê hejmara xetên “Alo Şidet” zêdetir bikin. Em ê ji bo jinên ku guhên wan baş nabihîzin, xetên alîkariyê yê cuda vekin.
- Em ê tenê piştgiriya aborî nedin jinan, her wekî din, em ê kursên pişesaziyê bi pêş bixin û ji bo ku jin bikaribin ji xwe re kar peyda bikin, em ê mekanîzmeyeke karîger ava bikin.
- Ji bo ku di warê civakî, aborî û çandî de piştgiriya jinan bike, em ê “gundên azad ên jinan” ava bikin û jiyanekê azad û derveyî tundiyê ji bo jinan ava bikin.
- Em ê bi teşwîqkirina atolyeyên zayenda civakî, li dijî tundiyê, atolyeyên xwe-parastinê ava bikin.
- Li dijî piştguhkirin û îstismarê, em ê “yekîneyên têkoşîn û şewirînê” ava bikin.

- Li dijî îstîsmara zayendî ya di nav malbatê de nayê eşkerekirin, em ê têkoşîneke piralî bimeşînin û ji bo mexdûrên enesetê, Navendên Dermankirina Trawmayê ava bikin.
- Wekî me berê kiribû, dîsa di rêveberiyên herêmî, di hemû peymannameyên giştî de, em ê cezayan li ser kesên ku tundî li jinan kirine, bisepînin. Em ê peymannameyên mêrên ku rê li ber derxistina potansiyela jinê digirin, xwedî kar û emelên nepak in (tundî, tacîz, destdirêjî, lêdan, heqaret, pir hevserî) fesh bikin.



**JIN BI HEV RE  
BI RÊ VE DIBIN**